
Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî — Jimar :1110 — 22-Cotmeh- 2023 — www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# Rojnamevan û pêşengê Romana Kurdî: Mihemed Uzun



Li ser koça dawî ya wêjevan, rojnamevan û nivîskarê Kurd Mehmed Uzun re 16 sal derbaz dibin. Mehmed Uzun bi rêya wêjeyê rastî, êş û destkeftiyên gelê xwe bi pênûsa xwe honand û heta roja me ya îro anî. Hefit roman û gelek ceribandin, lêkolîn û helbest li pey xwe hêla û îro weke pêşengê Romana Kurdî ya moderan tê pejirandin.

Wêje weke hunereke ya têgihandina hest, hizir û xeyalên mirovan bi awayekî xweşik û bi bandor anîna zimane. Civakeke bê wêje nabin û her civak bi wêjeya xwe tê naskirin. Gelê Kurd wêjeyê ji demên kevin heta îro, ji bo berdewamkirina çand û nasnameya xwe bikaranîne. Gelek wêjevan, nivîskar, hunermend û rojnamevanên Kurd ên pêşeng bi rêya wêjeyê rastî êş û destkeftiyên gelê xwe bi pênûsa xwe honandine û heta roja me ya îro anîne.

Yek ji wan pêşengan jî wêjevan, rojnamevan û nivîskar Mehmed Uzun e. Mehmed Uzun di sala 1953'an de li Sêwereka girêdayî bajarê Riha ya Bakurê Kurdistanê ji dayîkbûye. Zarokatiya xwe li wir derbazkiriye. Weke her zarokekê çanda pêşî ji malbata xwe, çand û folklora zarokatiyê jî ji zarokên taxê hîn dibe û bi wan re dileyîze. Dibistana seretayî, navîn û amadeyî li Sîwerekê diqedîne.

Di wê demê de wekî gelek bajarên Kurdistanê li Sîwerekê jî tevgera welatparêzî û şoreşgerî hebû. Piraniya xortên Sîwerekê li gel Mehmed Uzun di nav tevgerê de cih digirin. Wêjevanê Kurd Mehmed Uzun piştî qedandina amedeyî ji bo xwendina bilind, derbazî bajarê Enqerê dibe û qeyda xwe li dibistana Mamostayan ya Teknîka Bilind çêdike û dest bi xwendinê dike. Ji ber nivîs û ramanên xwe yên bi Kurdî, piştî Cuntaya Leşkerî di sala 1972'an de tê girtin, li ser vê tewqîfa wî tê birîn û dikeve zîndana Enqerê û Amedê. Nêzîkî du salan di wan zîndana de tê girtin. Dadgeha leşkerî 8 sal ceza lê birrî, lê di heman salê de efuya giştî derket û ji zîndanê rizgar bû. Di sala 1976'an de Mehmed Uzun li gel komek hevalên xwe li Enqerê kovara 'Rizgarî' damezrînin. Vê komê ji bo fêrbûna Kurdî Mehmed Uzun û Xatîce Yaşar veqetandin. Piştî her du hatin perwerdekirin, di vê kovarê de mijarên Rêzimana Kurdî û ramyarî dinivîsandin.

Di sala 1977'an de ji ber gef û zextên dewletê derdikeve derveyî welat. Di sala 1978-1981'an de li Siwêdê kovarek mihane bi navê 'Rizgariya Kurdistanê' tê derxistin ku Mehmed Uzun dibe redektorê wê kovarê. Mehmed Uzun ji sala 1977'an û wir ve li Siwêdê jiyan xwe didomîne. Ji derveyî welat jî dev ji xebata xwe ya rojnamevaniyê naberda. Weke nimûne; 1978-1981 kovara Rizgarî, 1986-1989 kovara Hêvî, 1986-1995 kovara Kurmancî, 1989-1992 kovara 90 tel, li gel vê Mehmed Uzun endamê yektiiya nivîskarên Siwêdê 'PEN', kilûba Siwêdê û Yekitiya Rojnamevanên Cîhanê bû û di van rêxistinan de dixebite.

Wêjevanê Kurd di salê 90'î de ji bo belavkirin û pêşxistina wêje û rê zimana Kurdî dest bi lêkolîn û nivîsariyan dike. Di sala 1992'an de destpêka Wêjeya Kurdî (Kurt Edebiyatina Giriş) û di sala 1995'an de jî Antolojiya Wêjeya Kurdî dinivîse. Mehmed Uzun di sala 2005'an de vedigere Tirkiyeyê û li Stanbolê dimîne. Di dawiya heman salê de ji aliyê Wezareta Rewşenbîriyê ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê ve li Hewlêrê tê xelatkirin.

Mixabin di sala 2006'an de tê zanîn ku bi nexweşiya penceşêrê ketiye. Wêjevan û rojnamevanê Kurd ê pêşeng Mehmed Uzun di 11'ê Cotmeha sala 2007'an de li Amedê jiyana xwe ji dest da.

Heft roman û gelek ceribandin, lêkolîn û helbest nivîsîne û weşandine. Mehmet Uzun ne tenê bi Kurdî dinivîsî, gelek berhemên bi zimanên Tirkî û Siwêdî jî dinivîsîne. Îro weke pêşengê Romana Kurdî ya moderan tê pejirandin.

**Hinek berhemên Mehmed Uzun wihane:**

Tu-Roman
Mirina Kalekê Rind-Roman
Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê-Roman
Destpêka Edebiyata Kurdî-Lêkolîn
Mirina Egîdekê-Destan
Antolojiya Edebiyata Kurdî
Ronî Mîna Evînê, Tarî Mîna Mirinê-Roman

# Çemê Bendîmahiyê kirin qurbana rantê



Çemê Bendîmahiyê ku çavkaniya herî mezin a ava ku diherike Gola Wanê, ji ber HES û bendavên ku li ser hatine çêkirin bi temamî zuha bûye. Bi mîlyonan masî û zindiyên di çem de tine bûn.

Çemê Bendîmahiyê ya li navçeya Bêgirî ya Wanê, ji ber bendav û HES'ên li ser hatine çêkirin û Karên Hîdrolîk ên Dewletê (DSÎ) av ji bo avdanê qut kiriye, zuha bûye. Ji ber zuhabûna ava çemê, bi milyonan zindiyên di çemê de dijîn, di nav wan de masiyê Încî Kefal jî heyî winda bûn.

**Bi milyonan zindî ji ber bêaviyê mirin**

Ji xeynî HES û bendavên li ser çemê, regulatorên avdanê yên ku ji aliyê Midûriyeta Herêma 17'emîn a Karên Hîdrolîk a Dewletê ve li ser 8 kîlometreya çemê Bendîmahiyê hatine bicihkirin yek ji faktorên herî mezin ên zuhabûna çem in. Ji ber bi temamî qapaxên regulatorê hatin girtin çemê Bendîmahiyê bi tevahî zuha bû û ev yek rê li ber hêk û masiyên biçûk ên Încî Kefal girt ku bigihêjin Gola Wanê.

**'Nîşaneya karîsetê ye'**

Serokê Komeleya Hawirdorê ya Wanê Alî Kalçik, diyar kir ku çema Bendîmahî di dîrokê de cara ewil e zuha bûye. Kalçik, anî ziman ku zuhabûna çem nîşaneya felaketê ye û wiha got: "Ji bo rantê, Çemê Bendîmahiyê ku bi bedewiya xwe ya xwezayî navdar e û bi milyonan zindî dihewîne hat îmhakirin. Zuhabûna Çemê Bendîmahî encama pergala kapîtalîst a hov e. Ji bo ku hin kes ji HES'an sûd werbigire, xweza tê tunekirin. Dewletê çemê Bendîmahî îro radestî alîgirên xwe kiriye. Dewlet nikare bazariya avê bike. Bin erd û ser erd milkê gel e, ne milkê dewletê ye. Bi milyonan zindî bûn qurbanê ranet ê."

**'Ji bo rantê xweza tê tunekirin'**

Kalçik di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: "Li herêma me ji xwe baran gelek nabare. Çavkaniya ava vê herêmê barîna berfê ye. Berfa ku di zivistanê de dibare, di bihar û havînê de çavkaniyên avê yên vê herêmê xwedî dike. Bi taybetî ji ber germahiya gilobal rêjeya herikîna çavkaniyên avê kêm bûye. Ji ber vê yekê gelek çavkaniyên avê zuha bûn. Di vê serdemê de ku germahiya gulobal ewqas bi bandor e, divê dewlet çavkaniyên avê biparêze, lê tam berovajî vê yekê dike. Li ser çavkaniyên avê yên heyî HES û bendav çêkirin. Ev HES û bendavên hanê bi kêrî gelê herêmê û xwezayê nayên, ji bo rantê didin alîgirên xwe."

Sudoku: Bersiv 21

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | 2 | 8 | 7 | 9 | 5 | 3 | 6 | 4 |
| 4 | 9 | 3 | 6 | 1 | 8 | 2 | 7 | 5 |
| 6 | 5 | 7 | 3 | 2 | 4 | 1 | 9 | 8 |
| 5 | 3 | 1 | 9 | 8 | 7 | 4 | 2 | 6 |
| 9 | 8 | 2 | 5 | 4 | 6 | 7 | 3 | 1 |
| 7 | 6 | 4 | 1 | 3 | 2 | 8 | 5 | 9 |
| 8 | 1 | 9 | 2 | 6 | 3 | 5 | 4 | 7 |
| 3 | 7 | 6 | 4 | 5 | 1 | 9 | 8 | 2 |
| 2 | 4 | 5 | 8 | 7 | 9 | 6 | 1 | 3 |

Sudoku:Pirs 22

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | 8 | | | 7 | | | 2 |
| | | | | | | 5 | 8 | 9 |
| | | 6 | | 5 | 2 | | 4 | 7 |
| | | 3 | | 6 | | | | 8 |
| | | | 7 | | 5 | | | |
| 6 | | | | 8 | | 2 | | |
| 3 | 1 | | 5 | 2 | | 9 | | |
| 9 | 6 | 5 | | | | | | |
| 7 | | | 3 | | | 1 | | |

# FERHENGA BIWÊJAN

**Kuçikên wî avêtin:**
- Qewitandin; qewirandin; berdanê; derxistin.

**Mêş hatiyê:**
- Hêrs bûye; tore bûye; pir xeyidiye.

**Mêşika wî heye:**
- Zû hêrs dibe.

**Min xwîn bi xwe ve dît:**
- Ez pir hêrs bûm.

**Mirov newêre ber siha wî re bibore:**
- Cira wî pir ne xweş e; pir bêhnteng e; pir zû hêrs dibe; ji bo ku şer bike li behaneyan digere.

**Mirîşk hêkan dike birh bi dîk dikeve:**
- Yek zehmetiyê dikişîne yê din tengav dibe, hêrs dibe.

**Navê wî nayne ser zimanê xwe:**
- Pir jê hêrs bûye.

**Pozê xwe bilind kir:**
- Hêrs bû; pir xeyidî.

**Qiyamet li serê me rabû/qiyamet li serê me rakir:**
- Pir hêrs bû.

**Rabû ser hêl û pepanan:**
- Dîn bû; har bû; xwe neqayîl kir; xwe hêrs kir.

**Rahişt şûrê xwe û derket meydanê:**
- Pir hêrs bû; har bû; êrîşî derdorên xwe kir; xwest şerê hina bike.

**Rayên mêraniyê li eniya wî rabûn:**
- Pir hêrs bû.

**Rûn di dest de be, rûdike (diavêje) te:**
- Pir bikîn e; pir zû hêrs dibe; dema hêrs dibe tiştek nayê bîrê, dikare her tiştî bike.

**Şoravka kêmav (pir şor) dîzikê diderizîne:**
- Kesê pir hişk, kesê pir bihêrs di dawiyê de zererê dide xwe.

**Şûrê xwe tûj kiriye:**
- Hêrs bûye; dijwar bûye; har bûye; pir xeyidiye.

**Textê min gelek mixan hilnade:**
- Min hêrs nekin; êdî ez nikarim xwe ragirim.

**Textikên min li hev ketin:**
- Ez dîn û har bûm.

**Tif di devê min de ziwa bû:**
-Ez pir hêrs bûm; ez pir aciz bûm; ez bêzar bûm.

**Tijî bûye:**
- Pir hêrs bûye; hindik maye ku biteqe.

Xezalê ji ber şkêvlatokê (kîso, kûsî) **zozan li xwe heram kir:**
- Ji ber ku ew jî xwe tîne qama yên ser xwe re yên ser re pir hêrs dibin.

**Xwe xwar:**
- Pir hêrs bû.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Ji tariyê ber bi ronahiyê ve



Şeş sal di ser rizgarkirina Reqayê re derbas dibin. Piştî berxwedaneke mezin a 134 rojan di 20'ê Cotmeha 2017'an de bajarê Reqayê ku bûbû sembola zilm û tarîtiyê, ji aliyê QSD'ê ve ji destên çeteyên hov yên DAIŞ'ê hat rizgarkirin.**R-5**

## 'Divê Abdullah Ocalan azad bibe'



**Endamê IPPNW Dr. Gîsela Penteker anî ziman ku tecrîd işkence ye û êdî bandorê li hemû civakê dike û got: "Divê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan azad bibe."R-3**


Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî — Jimar : 1110 — 22-Cotmeh- 2023 — www.ronahi.net/ku/

# DI SALVEGERA PEYMANA EDENEYÊ DE PLANÊN DEWLETA TIRK

20′ê Cotmehê salvegera Peymana Edeneyê ya di 1998′an de di navbera hikumeta Şamê û dewleta tirk de hatiye îmzekirin. Dewleta tirk vê peymanê wekî derfet hîna jî ji bo planên xwe bi kar tîne. Lê "Çareserî di lihevkirina Sûriyeyiyan de ye; rejîmê û oposîzyon. Her wiha bi hemû hêzên li ser erdê aktîf re ye, bi taybet bi Meclisa Sûriya Demokratîk (MSD) re der barê bernameya yekitiya nîştimanî de ku berjewendiyên hemû aliyan were parastin. Bi wê re dewleteke adilane, maf û qanûnê di foruma wê ya serdemê ya dewleta nenaendî ya medenî, ilmanî û demokratîk de ava dibe."**R-4**




## Helbestvan û ramyarê Kurd Cegerxwîn



Cegerxwîn di sala1903`an de li gundê Hesarê hatiye dinyayê, navê wî Şêxmûsê Hesen e, 11 bira û xwişkên wî hene, Birayê wî Xelîl û xwişka wî Asya tenê jiyan dikin Yên din çûne ser dilovaniyê Xwedê.**R-7**

## jinên afrîner




Dema mirov bi awayekî berfireh li dîroka mirovahiyê binêre, wê berhem û rastiya jinên avaker bibîne. Jinên ku ji destpêka jiyanê ve rihê jiyanbûnê di nav civakê de avakirine, heger em ji civaka xwezayî heya roja me ya îro bigirin dest em ê bibînin ku her tişt bi destê dayika afrîner hatiye avakirin. Lê ev hemû afrînerî jî ji aliyê mêrên serdest ve hatiye talan kirin.**R-2**

## Bîlancoya şerê Hemas û Îsraîlê



Wezareta Tenduristiyê ya Filistînê ragihand ku ji 7′ê Cotmehê ve herî kêm 4 hezar û 137 filistînî ji ber bombebaranên Îsraîlê jiyana xwe ji dest dane.**R-3**

## 'Êrîşên dagirkeriyê jêderên enerjiyê ji kar derxistin'

Dewleta Tirk a dagirker di êrîşên xwe de binesaziya herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir armanc, Rêveberê Nivîsgeha Enerjiyê Ziyad Rustim da zanîn ku ji ber êrîşan jêderên bingehîn yên elektrîk û enrjiyê ziyanên mezin dîtine û çaksazkirina wan jî gelekî zehmet e.**R-6**




Çarenivîsa Filistîn û Kurdistanê — Ahmed Aktaş — R-4


Ancax şoreşgeriya Netewa Demokratîk Be.. — Idrîs Henan — R-5

Cotmeh meha Bêrîtan e — Zozan Cızîrî — R-2

# Jinên afrîner

Ciwana Mûsa/Qamişlo

Dema mirov bi awayekî berfireh li dîroka mirovahiyê binêre, wê berhem û rastiya jinên avaker bibîne. Jinên ku ji destpêka jiyanê ve rihê jiyanbûnê di nav civakê de avakirine, heger em ji civaka xwezayî heya roja me ya îro bigirin dest em ê bibînin ku her tişt bi destê dayika afrîner hatiye avakirin. Lê ev hemû afrînerî jî ji aliyê mêrên serdest ve hatiye talan kirin. Gelek jinên berhemdar hene ku bi raman û dahênanên xwe yên nûjen bandor li cîhanê kirine. Dive bê zanîn ku jinan di hemû warên zanistî, teknolojî, civakî, çandî û nûjeniyê de kedên giranbuha di seranserî dîroka hemdem de dane û tekez kirine ku ew dahênerên bingehînin. Ji ber vê yekê me 11 afrandinên jin yên ku bêyî wan jiyana me ya nûjen nedihat meşandin. Li vir afrînerî û keşfên herî girîng ên ku jinan pêş xistine û di pêşketina mirovahiya nûjen de beşdar bûne ev in:




### 1- Girîs Hopir

Girîs Hopir,"Dayika Komputeran." Piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn, Hopper li zanîngeha Harvardê ji bo pêşxistina IBM Harvard Mark kar dikir, yekem komputera bazirganî li cîhanê derxist. Herweha roleke wê ya pir çalak di xuyakirina zimanê bernamesaziyê û danîna bingehên wê de hebû. Hopir zêdetirî 50 lêkolîn li ser Înformatîk weşandin. Ew di sala 1986 an de dema ku ew 80 salî bû, teqa'id bû û di sala 1992'an de wefat kir, xelkê wê demê jê re digotin "dayika komputeran."

### 2- Stîvanî kolîk

stîvanî lêkolînerek kîmyewî ye, madeya (Kevlar) keşf kir, ku pênc qat ji Fûlaz bihêztir e. Vedîtina wê bû sedem ku ew di sala 1966'an de mertalan ji bo parestina şervanan çêke. Vê dahênana stîvinî bi mîlyonan şervanên ewlehiyê li çaraliyê cîhanê xilas kirin. Madeya ku Stîvanî keşif kir paşê di gelek pîşesaziyan de hate bikar anîn, wek kabloyên pira daleqandî û alavên konan.

### 3-Elîs Parker

Parker yekem dahênera Amerîkî bû. Wê di sala 1919'an de ji bo ku dawî li bikaranîna dar û komirê di malan de bîne, alavên germkirinê afrand, ya ku îro wekî pergala germkirina navendî tê zanîn.

### 4-Margirêt Nayit

Margirêt xuliqkariyek ji bo amûrekê stend ku binê çenteyên kaxezê wekî ku em îro pê dizanin, xêz dike, ev yek bû sedema karanîna berfireh a kîsikên kaxezî di dema ku kîsikên plastîk tune bûn. Ya ku dahênana wê ber bi cîhana firotanê ve kir. Margirêt beriya mirina xwe zêdetir 26 xelat wergirt.

### 5- Formula rakirina şaştiyên çapkirinê

Pat, ku karsazeke Amerîkî bû û pispora reklam û çapê bû, di metbexa mala xwe de dest bi ceribandina formula jiholêrakirina tîpan kir, heya ku wê formula rast piştî sala 1958'an de dît. Di sala 1979'an de Pat dest bi firotina berhema xwe kir.

### 6- Mary Andson, Paqişkirina camên otomobîlan

Di sala 1900'an de dema ku baran û berf dibariya, ajokar her çend metre carekê disekinîn da ku camên otomobîla xwe paqij bikin. Di sala 1903'an de, Mary Andson ev pirsgirêk çareser kir dema ku wê paqijkere otombîlan îcad kir. Mirov di destpêkê de ji îcada Meryemê guman dikirin, difikirîn ku paqijker dê bala şofêr bikişîne, lê bi demê re ev afrînerî bi bandor derket, ji ber ku îro tu otomobîl ji wê bêpar nemaye.

### 7- Sîstema pêwendiya "Wi-Fi", Haydî Lamar

Haydî Lamar lîstikvana Otrîşî-Amerîkî ye ku wêneya wê ji aliyê kovara "Time" ve di nîvê salên pêncî de bi sernavê "Jina herî bedew li cîhanê" li ser bergê wê hatiye danîn. Sê welatên: Avusturya, Almanya, û Swîsre rojbûna wê wekî "Roja Dahêner" pîroz dikirin ji bo rêzgirtina wê û destkeftiyên wê yên zanistî, bêyî wê tiştek wekî "Blotos", "Wi-Fi" wê nebe. Digel ku di dema xwe de lîstikvanek navdar bû, Haydî zanyar û lêkolînerek bû, pergalek ragihandinê pêşxist ku Amerîka weke çekek veşartî dihesiband ku di dema Şerê Cîhanê yê Duyemîn de alîkariya wan kir. Piştî bidawîbûna şer, teknolojiya Haydî berdewam kir da ku bibe bingeha geşbûna pêwendiya nûjen, wek têlefonên desta, Wi-Fi, GPS, û pergalên ragihandinê.

### 8- Pêşxistina lêzerê ji bo emeliyata çav, Patrîsa Bath

Doktora yekem a bi eslê xwe Afrîqî ku di sala 1988'an di warê bijîjkî de patent tomar kir. Patrîsa beşdarî amûra lêzeriya bijîjkî ji bo neştergeriyê prosedûra herî rast bû.

### 9-Zanîngeha Al-Qarawî, Mereyem û Fatimaal Alfehrî

Zanîngeh ne daneyeke lê ew ramaneke ku gelek beşdarî belgekirin û hînkirina zanistê bû, Damezirandina zanîngehê ramaneke jinan bû ku di sala 877'an de wek yekemîn zanîngeh di dîrokê de ji aliyê Mereyem û Fatimaal Alfehrî ve hat damezrandin.

### 10-Marî Korî(1867-1934)

Marî fîzîknas û kîmiya zana Polanî ye, ku ji pêkhateyên uraniyomê tewriya tîrêjê pêşxist û têgeha "Radiyakitîvîtiyê" derxist. Ew jina yekemîn bû ku xwendî û li zanîngeha parîsê mamostetî kirî. Di sala 1911'an de Xelata Nobelê ya Kîmyayê wergirt piştî ku hêmanên poloniyum û radyûm di sala 1898'an de keşif kir. Van vedîtinan bandorek mezin di warê bijîşkiyê de kir, ji ber ku radyûm rê da pêşkeftina tîrêjên X-ê, ku alîkariya bijîjkan ji bo naskirin û dîtina şikestinên hestî û nexweşiyên giran yên di organên hundir de kir.

### 11-Pergala Ewlekariya Malê, Mary Van Brittan Brown

Mary Van Brittan Brown xebatikareke tendrustiyê bû, ew pir caran li mala xwe bi tenê dima. Ji ber vê yekê ew herdem dihizirî ji bo ku mala xwe ewletir bike. Mary tevî mêrê xwe Albert, yekem pergala ewlehiya malê wekî bersivek li hember zêdebûna rêjeyên sûc û performansa xirab a polîsan di salên 1960'î de bi pêş xist. Pergala ku Mary Van Brittan Brown afirand hinekî tevlihev bû, ji ber ku ew kamerayek motorîzekirî ya ku wê li dora deriyê xwe yê pêşiyê rakir û daxist da ku hebûna kesê ku hewl bide têkeve hundurê malê de destnîşan bike.

## Ramangeh

### Cotmeh meha Bêrîtan e

Zozan Cizîrî

Her serdemek leheng û mêrxasên xwe yên bûne destan, bûne navnîşana demê hene. Ev destan her tim bi kevneşopiya li dû xwe hiştine tên bîranîn, wekî ruhê demê her kêliyê nûjen dibin. Belê dem jî hafizeyeke xwe heye û her tim di rastiya van destanan de mirov bi hebûna wê dihese. Û Cotmeh, meha Bêrîtan (Gulnaz Karataş) û Bêrîtanbûnê. Bêrîtana ku li hemberî sîstema pênc hezar salî ya desthilatdariya zilam, li hemberî bindestiya jin bi hêz û îradeya xwe ya azad serî rakirî û bi zanista jin a dîrokî roja 25'ê Cotmeha 1992'yê hemû paşverûtî û xiyanet di zinaran de werkirî…
Ji destpêka sazbûna sîstema desthilat û dewletê heya roja îro her ku di navbera du hêzên dewletdar de şerek diqewime, tim du dîmen derdikevin pêş; zilamê şerker û qehreman, jina belengaz a çavşil, destê xwe dayî ber asman û bêçare dike hawar hawar. Jixwe hejmara destdirêjî, revandin û qetilkirina jinan tu caran rast nayê dayîn. Di vê sedsala 21. de jî ku dilxwede behsa çaxê pêşketin û çûyîna ser pişta heyvê dikin, rojane bûyer û trajediyên wisa dubare dibin. Di nava vê trajediya cîhanî de Rêber Apo di kesayeta Bêrîtan û Zîlanan de wekî riyek nû deriyê çareseriyê li tevahî jinan vekir. Eşkere kir ku, çarenûsa jin tenê girî, hawar û qêrîn, kuştin û destdirêjî nîn e. Ji bo wê gava em dikevin 30 saliya rastiya jin a Bêrîtanî, ev heqîqet bêhtir mirov dixe nava lêhûrbûn û lêpirsînê. Ma bes nîn e jin ev çend di bin potînên leşkerên vê sîstema sermayedar û xwînmij de diperçiqin? Madem berdêla herî giran a van şerên desthilatdaran herî zêde dayîk-jin didin, çima êdî jin di rêya Bêrîtan de xwe nekin yek û helwestek dijber a çareseriya bi rengê jin ferz nekin? Rûmeta jin li gel Bêrîtan e, azadiya jin û civakê li gel Bêrîtan e, serbestî û xweşiya jiyanê jî li gel Bêrîtan e. Bêrîtan bangek e ji bo her jin û ferdeke civakê, ew banga "Jiyana bi azadî nebe, qet ne jiyan e!" Û jiyana her kêliyê gefa şerên xwînrij li ser, di bin tirs û koçberiyê de çima mirov qîma xwe pê bîne! Ji bo vê yek car pêwîst e ku, hemû jin tevî civaka xwe bi hev re biherikin meydanan û dawî li vê sîstema diz û celadên serdemê bînin.
Ji bo wê îro roj hatiye em wekî Bêrîtan vê carê ne tenê wan desthilatdar û xayînan li zinaran wer bikin, divê em zinaran bi ser wan de hilweşînin ji bo jiyan û cîhanek xweş, azad ku zarokên îro êdî bi xweşî û serbest rabin. Ji ber Bêrîtanan di vê Sedsala 21. de deriyê azadî û aramiyê heta dawî li me vekirine.

# Li Wanê jin ber bi azadiyê ve dimeşin



Jinên Wanê derbarê kampanyaya TJA'yê ya 'Bi jin jiyan azadiyê re ber bi azadiyê ve' axivîn û wan got, gund bi gund kolan bi kolan, tax bi tax ew xebatan dimeşînin.
Tevgera Jinên Azad (TJA), bi dirûşma 'Bi jin jiyan azadiyê ber bi azadiyê ve' di 15'ê Îlonê de kampanyaya xwe li Rihayê da destpêkirin. Piştre kampanya derbasî bajarên din bû. Li Wanê, di çarçoveya kampanyayê de xebat hatin destpêkirin.
Di 16'ê Îlonê de li Qada Beşyol a Wanê daxuyaniyek hat dayîn û piştî meşê, jinan di çarçoveya kampanyayê de dest bi xebatan kir. Hevseroka Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) a Artemîtê, Bêrîvan Çaglayan, derbarê kampanyayê de got, "Bi taybetî li gelek taxan fuhûş, bikaranîna hişbirê pir zêde bûye. Em bi jinan re hatin gel hev û me got, divê li ser vê mijarê hestiyarî hebe. Em vê ji polîtîkayên dewletê cuda nabînin. Li dijî bikaranîna hişbirê, xebat tinene."

### Li dijî tecrîdê hestiyarî

Bêrîvanê di dewamê de bal bire ser tecrîdkirina Rêberê Apo û got: "Girêdayî polîtîkayên tecrîdê, li girtîgehan binpêkirin zêde dibin. Herî dawî li girtîgeha Tîpa L ya Panosê li sê girtiyên jin êşkence hat kirin. Ev êşkence nayê qebûlkirin. Li dijî polîtîkayên tecrîdê divê gelê me bi hestiyar be. Li dijî vê, em her kesî vedixwînin têkoşînê."
Hevseroka HDP'a Westanê Fîlîz Arslan jî wiha nêrînên xwe anîn ziman: "Di çarçoveya kampanyayê de em gund bi gund, tax bi tax bi jinan re tên gel hev. Em ê li navçeyê, bi hemû jinan re bên gel hev. Navçeya me di warê hilberîn û çandiniyê de gelek giring e. Tevî vê, pirsgirêkên aboriyê hene. Em ê li dijî polîtîkayên desthilatdariyê gelê xwe agahdar bikin û em bang dikin da ku hêzê bidin kampanya me."

### Ji bo jinên ciwan atolye

Endama Komeleya Jinan a STAR, Serap Guvenç jî der barê xebatên kampanyayê de got, bi gelek xebatên atolyeyê re di nava kampanyayê de wan cih girtiye û wiha peyivî: "Me ji bo jinên ciwan derbarê pirsgirêkên mobîng, tundî û starê de atolye pêk anîn. Xebatên me yên atolyeyan wê bidomin."



# Jina kurd hebûna çanda xwe diparêze

Jina kurd xwedî dewlemendiyek çandî ye, çanda dayika xwedand ji nifşek derbasî nifişkî din dikir û çanda xwe ji desthilatdariya baviksalariyê parast, hişt çand zindî bimîne.

Ronaz Silêman/Qamişlo

Kurdistan yek ji wan qadan e ku xwedî dewlemendiyek çandî ye. Erdnîgariyek berfireh e ku ji bawerî, ol, çand û zaravayên cihê yên kurdî re malovaniyê dike. Yên ku di dem û dîrokên cuda de hişt ev çand zindî bimîne û bûn perçeyek ji vê dewlemendiya çandî jin e. Jin di dîrokên cuda de tev li raperînan û têkoşînan bûne. Lê têkoşîna wan herî zêde jî di qada çandî de li pêş bûye. Bi stran, çîrok, helbest, destan û heyranokan, êş, keder û serpêhatiyên xwe anîne ziman.

### Çand li ser nirxên civakê hatiye avakirin

Li Kurdistanê parastina çand û ziman bi hêz bûye. Di her serdemê de jinê bi awayekê ev nirxên çandî li dora xwe civandiye, hay ji vê yekê bûye ku ev hafize ew ê veguheze çaxeke din û bi vê berpirsyariyê rabûye. Jin tevî nêzîkatiyên paşverû, pîvanên zilam, êrîşên dagirkerên welatê xwe, dîsa jî dest ji têkoşîna xwe bernedan e, bi taybet di qada çandê de, bêguman ev hemû tiştên ku bi ked û hişê hevpar ê jinan pêk hatine, teşe girtiye; ev tişt berhem û hêmanên bingehîn ên çandê pêk anîn e. Di nav jiyana civakî de jin bi vê ferasetê nêz bûye, li dora civakê çanda heyî ya dewlemend hîn bi hestyarî honandiye û derbasî roja me ya îro kiriye. Ev yek bi taybetî ji bo civaka me ya kurd ku di her serdemê de rastî qirkirina çandî dihat, girîng bû. Ji ber ku çand nasnameya herî bi hêz a xwepênasekirina civakan e. Çand li ser nirxên civakê ava bûye, çand xwebûn e, nasnameya civakî ye ku bi kevneşopiya berxwedana jinê heya roja me ya îro




hatiye parastin. Ger ev têkiliya xurt a dîrokî bê qutkirin, dibe ku mirov nikaribe dîsa bi vê rola xwe rabe û bibe dengê têkoşîn, êş, koçberî û lorînên gelê xwe.

### Jin jiyanê bi rê ve dibe

Çanda dayîktiyê ku bingeha avakirina civakbûnê ye, tevî hemû êrîşên zîhniyeta baviksalariyê jî heta roja me ya îro hebûna xwe diparêze. Çanda dayîkê ew çanda ku ji aliyê jinan ve tê birêvebirin. Berovajî çanda baviksalariyê ye, di vê çandê de jin rêveberên. Di çanda dayîktiyê de tu maf nayê paşguhkirin, her kes xwedî erke û li gorî erka xwe tev digere û desthilatdarî tune ye. Lê çanda baviksalarî berovajî çanda dayîktiyê bi zext, talan, kuştin û hwd, hatiye avakirin. Mêr bi êrîş û talankeriyê çanda dayîktiyê têk bir û li ser çanda dayiktiyê çanda xwe danî û wê jî wekî rastî pêşkeşî civakê kir. Di feraseta baviksalariyê de jin tenê weke koletiyê lê dihat nerîn. Jin jiyanê bi rê ve dibin û civak li dora jinan teşe digire.
Derbarê rola jin di pêşketina çandê de Kordînasyona Tevgera Hîlala Zêrîn a bakur û rojhilatê Sûriyê Mizgîn Çolax diyar kir ku heger mirov bixwaze çivakekê bide naskirin, destpêkê çanda wê civakê divê bê naskirin û wiha got: "Di pêşketina civakê rola çandê sereke ye. Jinê di dîrokê de û heta niha xwedî li çandê derketiye, yê ku parastina çandê jî kiriye jin e. Jin di milê kevneşopî, perwerdekirina zarokan, wekhevî di hundirê civak û malbatê de pêşeng e, li ser vê bingehê em dibêjin jin xwedî çand e. Em dixwazin bi girîngiyeke mezin, çandê di roja ya îro de zindî bikin û di nav civakê de belav bikin. Jina kurd çand ji nifşekî derbasî nefîkî din kiriye û nirxê çandê parastiye."

### 'Çanda dayika xwedawend zindî bikin'

Mizgîn Çolax di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: "Di rewşa me ya niha de, tiştê ku em di bakur û rojilatê Sûriyê de jiyan dikin, di aliyê siyasî, diplomasî, civakî û şerê taybet de ku li ser herêmê me pêk tê, herwiha şerê taybet ku li ser jin û ciwanan pêk tê, armanc jê ku çand û civak tune bikin û eyînî dîrok dûber bikin. Di dema îro de êdî dewletên dagirker bi şerekî nû weke şerê taybet ku li ser ciwanan dide meşandin, dixwazin jin û ciwanan ji nirxên çandan wan dûrbixin. Herwiha dixwazin çandên cudayî yên derveyî exlaqê civaka me bidin avakirin. Ji bo pêşîgirtina li pişaftina çanda herêmê û ya gelê me, navendên çandî li ser asta bakur û rojhilatê Sûriyê hatine vekirin. Beşek ji ciwanan berê xwe didin çandê û beşek jî hîna di bin bandora şerê taybet de ye, beşê ku bandoriya şerê taybet li wan hetiye kirin, perwerdeyên di aliyê çandî, hizirî û hunerî de dibînin. Em dixwazin bi riya hunerê çanda xwe di nava civakê de zindî bikin, bi taybet çand dayîka xwedawend ya ku ewqas



sal hatiye windakirin zindî bikin."

### 'Bi riya navendên çandî, em xwedî li çanda xwe derkervin'


Mizgîn Çolax diyar kir ku navenda Hîlala Zêrîn parastina çandê ye û wiha got:"Di hundirê bakur û rojhilatê Sûriyê de Tevgerê Hîlala Zêrîn ji sala 2016`an ve hatiye avakirin, di 2016`an de konferans hatin li dar xistin û navend li kantonan hatin vekirin. Em dixwazin bi riya navendên çandî, xwedî li çand xwe derkevin. Di hundirê çandê de mijarên çandî yên cuda hene wek; Çandî, hemû beşên hunerî, muzîk, stran, şano, wêne û perwerdeyên muzîkê bi hemû awayê xwe, di hundirê navendê de hatine vekirin, bi taybet di milê jin de, destpêkê wek zehmetiyê ku dihatin derbaskirin ew bû ku mamosteyên jin tunebûn, bi demê re jin cihê xwe di nav de girt. Heger em xwedî li çanda xwe derkevin kes xwedî li çand me dernakeve, ne tenê gelê kurd hemû gelên ku di hundirê bakur û rojhilatê Sûriyê de jiyan dikin, ev yek jî bi riya çalakiyên hunerî ku tên çêkirin em xwedî li çandê derdikevin."

### Pirojeyên Hîlala Zêrîn

Kordînasyona Tevgera Hîlala Zêrîn a bakur û rojhilatê Sûriyê Mizgîn Çolax axaftina xwe wiha qedand: "Amadekariyên me wek Hîlala Zêrîn ji bo demê pêş, pêşengehekê wêne li ser asta bakur û rojhilatê Sûriyê bê çêkirin, di destpêkê de wê ji Dêrik heta Şehbayê hatiba çêkirin, lê ji ber rewşa heyî pilansazî hat guhertin, li ser asta sê kantona wê bê çêkirin, pêşengeh girêdayî şoreşa jin di hundirê Rojava de. Ya din jî amadekarî ji stiranekî li ser asta bakur û rojhilatê Sûriyê bi tevlîbûna hemû hunermendên kantonê, ev stiran girêdayî civaka xwezayî ye, demê ku jin wekhevî di nav civakê de dimeşand, em dixwazin bi riya stiranekê dîrok civaka xwezayî veguherînin. Herwiha pirojê ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo jî hene, ji ber niha dem dema azadiya Rêber Apo ye. Û di her kantonekê de jî şebihêrk bên çêkirin."

# Helbestvan û ramyarê Kurd Cegerxwîn

Cegerxwîn di sala1903`an de li gundê Hesarê hatiye dinyayê, navê wî Şêxmûsê Hesen e, 11 bira û xwişkên wî hene, Birayê wî Xelîl û xwişka wî Asya tenê jiyan dikin Yên din çûne ser dilovaniyê Xwedê. Ew hê di salên zaroktiyê de dest bi kar kiriye, ew di 15-16 saliyê de dê û bavê xwe winda dike, navê bavê wî Hesen e û navê diya wî Eyşan e. Di salên 1918 û 1920'an de di riya hesinî de kar dike. Di salên 1920 -1927`an de ew diçe Diyarbekir û li ber destê şêx û melan dest bi xwendinê dike. Di sala1924`an de Cegerwxîn dibe welatparêz.
Di sala 1927`an de ew vegeriya (Tilşihîrê) û bi keça xalê xwe Kehla Selîm re dizewice û dû re li Amûdê bi cih dibe. Di 1928`an de Cegerxwîn dibe seyda û melatiyê dike. Ew bû melayê gundê Hazda Jorîn, paşî melatiyê berdide.
Di sala 1934`an de komeleya Ciwan kurd ava dikin, lê dagirkarên



frensî komelê digirin, Di sala1946`an de Cegerxwîn dikeve Xoybûnê û têde kar dike. Piştre navê rêxistinê diguherînin, dikin Civata Azadî û Yekîtiya Kurdistanê. Damizirînerê civatê Ehmed Nafiz e, Cegerwîn mala xwe ji gund dibe bajarê Qamişlo.
Di navbera salên 1948 û 1957`an de ew dibe komûnîst û endamê Partiya Komûnîst a Sûriyê. Di sala 1949`an de ew cara pêşîn tê girtin. Di sala 1950`î de ew dikeve Civata Aştîxwazên Sûriya yê û bi wan re kar dike. Di sala 1957`an de Cegerxwîn ji Partiya Komûnîst dûr dikeve û rêxistina Azadî avadike.Piştî rêxistina Azadî bi Partiya Demokrat a Kurdî dibin yek.
Di salên 1959-1962` an de partî wî dişîne Başûrê Kurdistanê, li Bexdayê di zanîngehan de hînî kurdî dibe. Ew sê salan li wir dimîne. Di sala 1962`an de ew vedigere Rojavayê Kurdistanê û dîsa tê girtin.
Di sala1963`yê de tê girtin û dikeve girtîgeha Mezê ya Şamê. Piştî demek nedirêj tê berdan û vedigere Qamişlo. Di sala1967`an de Cegerwîn bû endamê Komîteya Navendî ya Partiya Demokrat a Kurdên Pêşverû li Sûriyê.
Di navbera salên 1973 û 1975`an de ew ji ber stemkariya hikûmeta Sûriyê diçe Libnanê û li wir dimîne. Li Libnanê dîwanên xwe yên bi navê "Kî me ez?" û ya "Salar û Mîdya" çap dike. Di salên 1976 û 1979`an de ew vedigere Sûriyê û heta sala 1979`an li wir dimîne.
Di sala 1979`an de Cegerxwîn diçe welatê Swêdê û di 22'ê Çiriya pêşîn di sala 1984`an li Swêdê diçe ser dilovaniya xwedê û li Qamişlo hate veşartin.

**Berhemên wî:**

Helbest
Dîwana yekem: Agir û birûsk di sala 1945`an de, Şam.
Dîwana duyem: Sewra Azadî di sala 1954`an de, Şam.
Dîwana sêyem: Kî me ez? di sala 1973`an de, Beyrûd.
Dîwana çarem: Ronak di sala 1980`an de, Stockholm.
Dîwana pêncem: Zend-Avista di sala 1981`ê de, Stockholm.
Dîwana şeşem: Sefaq di sala 1982`yê de, Stockholm.
Dîwana heftem: Hêvî di sala 1993`yê de, Stockholm.
Dîwana heştem: Aştî di sala 1985`an de, Stockholm.

### Ziman û ferheng

Destûra Zimanê kurdî, 1961, Bexda
Ferheng, perçê yekem, 1962, Bexda
Ferheng, perçê diwem, 1962, Bexda

# Parêzerên Efrînê: Li hemberî sûcên dagirkeriya Tirk divê cîhan bêdeng nemîne

Dagirkeriya Tirk bi armanca qirkirina gelê kurd êrîşên dijmirovî li dijîherêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêk tîn e. Yekîtiya Parêzeran ya Efrîn û Şehbayê tekez kirin ku dewleta Tirk tevahiya zagonên navneteweyî bin pê dike.

**Zana Roj/ Şehba**

Dagirkeriya Tirkiyê ji destpêka avakirina Rêveberiyta Xweser li Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Rojane ev herêm kiriye navenda hovîtî û armanca xwe, di serî de hewil da ku terora DAÎŞ ê li herêmê bi cih bike, her wiha bajarê Efrînê Dagir kir, piştî wê Serê Kaniyê û Girê Sipî dagir kir. hovîtiya dewleta Tirk ya li ser gelê Kurd û bi taybet di herêmên Rêveberiya Xweser de di vir de nesekinîn. Faşîzma Tirkiyê bi rêxistin kirina şaneyên DAÎŞ di nava gel de heyanî vê kêliyê didome. Bi van polîtîkeyan dixwaze destkeftiyên herêmê, pirojeya Netewa Demokratîk her wiha ewlehiya herêmê talan bike. li hermber van siyasetan têkoşîneke pir alî ji aliyê gel û hêzên herêmê ve hat meşandin. Bi vê yekê tavahî siyaset û pilanên dagirkeriyê vala derxistin. Ji dîroka 5 ê Cotmehê de faşîzma Tirkiyê careke din bi hovîtî êrîşên xwe li ser tavahî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi giranî dest pê kirine. Li seranserî sînor ji Şehba heyanî Dêrîkê êrîşên hawayî û bejayî hatine dest pê kirin, her wiha hedefgirtina sivîlan jî kiriye armanc. Li hember vê pêvajoyê tavahî gelên herêmê rabûne ser piyan û van êrîşan bi tundî şermezar dikin. Têkildarî vê yekê Parêzerên herêma Efrînê Roşîn Hido û Cibraîl Mistefa nêrînên xwe ji rojnameya me re anîn ziman.



Roşîn Hido



Cibrayl Mustefa

**"Dagirkeriya Tirkiyê hîn di xeyalên xwe de jiyan dike"**

Parêzer Roşîn di destpêkê de anî ziman ku êrîşên dagirkeriya Tirkiyê berdewam kirina pilanên qirkirina gelê Kurd e û wiha got: "dagirkeriya Tirkiyê bi destpêkirina van êrîşan re dixwaze pilan û xeyalên xwe yên sed salî yê qirkirina gelê Kurd û pêkanîna xeyalên Osmaniya ye. Bi taybet di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de û bi pêkanîna pirojeya Netewa Demokratîk di nava pêkhateyên herêmê de. ev bû weke derbeyekî dîrokî ji dewleta Tirkiyê re. ji ber vê yekê rojane dagirkeriya Tirkiyê (Erdoxan) di nava xeyalên xwe yên ji bo hilweşandina vê pirojeyê de jiyan dike. Ji ber ev piroje di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de, bû sedema pêkneanîna Mîsaqa Milî di Sûriyê de ev yek jî hêrsa Tirkiyê bêhtir kir. Ji ber van sedeman dîsa careke din pilan û êrîşên xwe li ser herêmê bi giranî dest pê kiriye".

**Binesaziya herêmê tê hedefgirtin**

Roşîn diyar kir ku di van êrîşên dawiyê de avahiyên bingehîn yên herêmê hedef digire û wiha domand: "Di êrîşên ku di 5 ê Cotmeha vê heyvê de da ye dest pê kirin. tavahî cureyên teknîk, çekên qedexekirî û hedefgirtina binasaziya herêmê û medeniyan pêk tîne. Ji destpêka êrîşan de, binasaziya herêmê weke nexwaşxane, firinên nan, bîrên petrolê, stasyona elektrîkê, kargehên herêmê û her wiha hedefgirtina sivîlan di nava bajaran de xistiye armancên xwe. Bi van hedefgirtinan di asta yekemîn de faşîzma Tirkiyê dixwaze tevliheviyê di nav gel û herêmê de bide avakirin û rê li ber koçberî û talankirinê veke. Lê heya niha em dibînin ku gelên herêmê bi tavahî pêkhateyên xwe di asta herî jor de li ber xwe didin".

**"Tikiyê di êrîşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê de zagonên navnetewî derbas kirine**

Her wiha parêzer Cibraîl di axaftina xwe de anî ziman ku êrîşên ku tên kirin tavahî zagonên navnetewî yên gitştî derbas dike û wiha got: "Di herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de zêdetirî 6 Milyon kes ji hemû pêkhateyan jiyan dike. Hedefgirtina herêmeke ewqas hemwelatî tê de jiyan dikin, bê guman muxalîfe û jiyana 6 milyon însan tevî zarokan dike xeteriyê. Di aliyê din li gorî zagonên navnetewî yên giştî bi taybet zagona mirovî ya navnetewî û Birotokola yekemîn ya Cinêvê yê ku bi awayekî tememî qedexeye ku binasaziya tu herêm yan dewletan bê hedefgirtin. Rûxmî ku ev yek tavahî zagonên ku me anîne ziman derbas dike, lê belê faşîzma Tirkiyê bi awayekî sîstemî van êrîşan pêk tîne. Ev yek jî hat tekez kirin dema serok wezîrê derve yê Tirkiyê Hekan Fîdan di daxuyaniya ku di 4 ê Cotmehê de da bû ragihandin".

**"Li hember qirkirina Gelê Kurd divê em bibin yek enî"**

Cibraîl destnîşan kir ku divê gelên herêmê bi tavahî pêkhateyên xwe û gelê Kurd li hember van êrîşan bê deng nemînin û bibin yek cebhe û wiha domand: "Di pêvajoya nû de dagirkeriya Tikiyê stratejiyeke nû daye pêşiya xwe, ew jî hedefgirtina sivîlan û hêzên leşkerî, her wiha binasaziya herêmê. li hember vê pêvajoyê di asta yekemîn de divê gelên herêmê bi hemû pêkhateyên xwe bibin yek enî û di asta herî jor de têkoşînê bidin meşandin. gelê Kurd li çar perçeyên Kurdistanê divê xwe ji van êrîşan qut nebînin, ji ber armanca van êrîşan qirkirina gelê Kurd e".

**"Divê Kowalisyona Navnetewî xwedî helwesteke cidî be"**

Cibraîl di dawiya axftina xwe de ev anî ziman :"Em banga Kowalîsyona Navnetewî dikin ku li hember pêvajoyê û sûcên şer yên ku dagirkeriya Tikiyê pêk tîne xwedî helwesteke cidî be. Dewleta Tirk bi destek dayîna ji hêzên terorist re, îsbat kir ku aliyekî resmî yê mezinkirin û piştgirtina terorê ye. Bi vê yekê careke din terore DAÎŞ ê tê bi rêxistin kirin û mezin kirin, ev yek jî xeterî li ser tavahî ewlehiya cîhanê dike. Li ser vî esasî û li gor zagonên navnetewî divê pêşî li siyaseta dagirkeriya Tirkiyê bê kirin"

# 'Êrîşên dagirkeriyê jêderên enerjiyê ji kar derxistin'

**Reşo Mihemed/Qamişlo**

**Dewleta Tirk a dagirker di êrîşên xwe de binesaziya herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir armanc, Rêveberê Nivîsgeha Enerjiyê Ziyad Rustim da zanîn ku ji ber êrîşan jêderên bingehîn yên elektrîk û enrjiyê ziyanên mezin dîtine û çaksazkirina wan jî gelekî zehmet e.**

Nivîsgeha Enerjiyê ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê di raporekê de ziyanên ku ji ber bombebarana balafirên Tirkiyê li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê derketine eşkere kir. Di rapora wê de hat eşkerekirin ku stasyona Siweydiyê ku hemû stasyonên Cizîrê dabîn dike, hat ruxandin. Ev sitasiyona navendî ye û elektrîkê dide hemû rawestgehên avê, aşxane, navendên tenduristiyê û xizmetguzariyê yên herêma Cizîrê ye.

Sitasiyon û rawestgehên ku hatin armancgirtin jî ev in:

Rawistgeha Tirbespiyê ya ku hemû gundewarên navçeya Tirbespiyê dabîn dike, hat armancgirtin. Di encamê de 75 hezar kes ji elektrîkê bêpar man.

Sitasiyona Bendava Rojava ya li Hesekê hat armancgirtin. Di encamê de 2 hezar kes ji elektrîkê bêpar man.

Sitasiyona bakurê Qamişlo jî hat armancgirtin. Di encamê de 2 hezar û 500 kes ji elektrîkê bêpar man.

Sitasiyona Amûdê ya ku navçeya Amûdê û gundewarê wê dabîn dike hat armancgirtin. Di encamê de jî 100 hezar kes ji elektrîkê bêpar man.

Di encama bombebarana dagirkeriya Tirk de stasyona şîrketa Rimêlan a berhemanînê, turbîna duyemîn û trafoyên sereke bi temamî hat ruxandin û têlên 1200 metre jî şewitîn.

Stasyona Dirbêsiyê jî, ji xizmetê hate derxistin, ev yek jî ji ber ku bi stasyona Amûdê girêdayî ye. Bi vî rengî stasyona avê ya Elokê ji xizmetê derket. Wekî têzanîn şêniyên Hesekê xwe ji stadyona Elokê ya avê werdigirin.

Di encama bombebarana balafirên artêşa Tirk a dagirker de stasyonên hevpar ên xizmetkirina neft û elektrîkê li bakurê Terbesbiya û Çilaxa hatin rûxandin û nêzî 100 gundan jî bê elektrîk man.

Girêdayî van êrîşan û ziyana ku gihaştiye sitasiyon û rawestgehên elektrîkê rêveberê Nivîsgeha Enerjiyê a bakur û rojhilatê Sûriyê, Ziyad Rustim ji rojnameya me re axivî.

**'Jêderên bingehîn yên elektrîk û enrjiyê ji kar derketin'**

Ziyad Rustum da zanîn ku jêderên bingehîn yên enerjî û elektrîka herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê ji xizmetê derketine û ev yek bandorê li cihên xizmetguzarî dike û wiha domand: "Dewleta Tirk a dagirker di serî de binesaziya vê herêmê kir armanca xwe ya sereke û hîna jî ev êrîş berdewam in. Destpêkê dagirkeriya Tirk sitasiyona elektirîkê ya Qamişlo, Amûdê, Tirbespiyê, Eyn Îsa û Kobanê bombebaran kir. Herwiha stasyona herî girîng ya Siwêdîkî jî bû armanca êrîşên dagirkeriyê. Ev stasiyon ya sereke bû û elektrîk ji wê diçû sitasiyonên din. Vê yekê jî bandor li nexweşxane, aşên genim, firneyên nan,sitasiyonên avê û hwd yên herêma Cizîrê û herêmên din kir. Bi sedema van êrîşan û tunebûna elektirîkê êdî ne di xizmetê de ne. Dewleta Tirk a dagirker sûcên şer di derheqê gel û Rêveberiya Xweser de dike. Ev yek jî ji ber ku dewleta Tirk hertim dixwaze pirsgirêkan li dewletên hawîrdorê xwe çêbike."

**'Çaksazkirina sitasiyonan gelekî zehmet e'**



Rêveberiyê Nivîsgeha Enerjiyê a bakur û rojihilatê Sûriyê, Ziyad Rustim, destnîşan kir ku çaksazkirina sitasiyonên elektirîkê yên ku bi sedema êrîşên dagirkeriya Tirk hatine ruxandin, gelekî zehmet e û wê zêdeyî 1 melyon dolar li wan here û wiha qedand :"Di encama êrîşên ku li ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê de hatin pêkanîn, gelek ziyan gihaştin sitasiyonên elektrîkê. Ev sitsiyon jî ji bo gelên bakur û rojhilatê Sûriyê jêdera dayîna elektirîkê ye. Herwiha çaksazkirina van sitasiyonan gelekî ji bo me zehmet e, ji ber ku kampaniyên cîhanî yên çêkirina wan, bi me re ne alîkar e. Di heman demê de dorpêça li ser herêma me jî astengiyan ji bo vê yekê çêdike. "



# 'Divê Abdullah Ocalan azad bibe'

Endamê IPPNW Dr. Gîsela Penteker anî ziman ku tecrîd îşkence ye û êdî bandorê li hemû civakê dike û got: "Divê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan azad bibe."


Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji 15'ê Sibata 1999'an û vir ve li Girtîgeha Îmraliyê di hucreya yek kesî de tê ragirtin. Ji sala 2014'an heta niha 5 caran bi endamên malbatê re hevdîtin kiriye. Herî dawî di Adara 2020'an de bi birayê xwe Mehmet Ocalan re rû bi rû hevdîtin pêk anîbû. Di van 24 salan de ku li Îmraliyê tê ragirtin, di 25'ê Adara 2021'an de tenê carekê telefon kir û ew cara dawî bû ku kesek pê re têkilî danî. Li aliyê din mafê wî yê hevdîtina bi parêzerên xwe re 12 salên ewil di hefteyê de bi saetekê dihat sînorkirin, lê her tim bikaranîna vî mafî dihat astengkirin. Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ku di navbera salên 2011-2019'an de tenê 5 caran bi parêzerên xwe re hevdîtin pêk anî, ji sala 2019'an û vir ve nikare bi parêzerên xwe re hevdîtinê bike. Gelek serlêdan hatin redkirin an jî bêbersiv hatin hiştin.



**'Tecrîd bûye polîtîkayek'**

Endama Yekîtiya Tabîbên Navneteweyî ya Pêşîlêgirtina Şerê Nukleerî (IPPNW) û Aktîvîsta Aştiyê Dr. Med Gîsela Penteker têkildarî tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan nirxandin kirin. Dr. Penteker destnîşan kir ku tecrîd li Tirkiyeyê bûye polîtîkayek û bandorê li hemû civakê dije.

Dr. Gisela Penteker diyar kir ku tecrîd bi girava Îmraliyê re ne sînorkiriye û daxuyand ku mafên bingehîn ên mirovan tên binpêkirin û got: "Tecrîd îşkence ye. Tenê li ser Birêz Abdullah Ocalan îşkence nayê kirin. Ev pergaleke îşkenceyê ye ku bandorê li her kesî dike û nayê qebûlkirin."



**'Divê Abdullah Ocalan azad bibe'**

Dr. Penteker anî ziman ku saziyên navnetewey li ser tecrîdê lêkolîneke têr û tije nekirine û bêdeng man. Gîsela Penteker ji ber ku CPT derbarê serdana Îmraliyê de rapora xwe neweşandin rexne kir. Dr. Penteker diyar kir ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji ber polîtîkayên tecrîdê yên dewleta Tirk û bêdengiya saziyên navneteweyî nikare bigihêje mafê xwe yê tenduristiyê û wiha got: "Abdullah Ocalan ne ciwan e, ji aliyê fizîkî ve kal e û ji ber vê yekê pêwîstiya wî bi kontrolên tenduristiyê yên birêkûpêk heye. Îro em dizanin ku girtiyên din ên siyasî di girtîgehên Tirkiyeyê de bi çi şert û mercî tên ragirtin."

# ADGB tevlî pêngava 'Ji Abdullah Ocalan re Azadî' bû

Yekîtiya Hêzê ya Demokratîk ya Ewropayê (ADGB) bi daxuyaniyekê diyar kir ku ew beşdarî pêngava ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û ji pirsgirêka Kurd re çareserî, bûne.

Yekîtiya Hêzê ya Demokratîk ya Ewropayê (ADGB) ragihand ku ew beşdarî Pêngava 'Ji Abdullah Ocalan re Azadî û Ji Pirsgirêka Kurd re Çareseriya Siyasî dibin' ku ji aliyê dostên gelê Kurd ve li 74 navenda hatiye destpêkirin û banga mezinkirina pêngavê kir.

Di daxuyaniya nivîskî de wiha hate gotin:

Erdnîgariya Rojhilata Navîn, Kurdistan û Tirkiye ji bo berjewendiyên emperyalîst bi xitimandinek mezin û şerên ku gelan li hember hev dixin ve têdikoşin. Gelan di nav xwîn, hêsir, birçîbûn û hejariyê de têkoşîna jiyanê didin.

Dewleta Tirk û desthilatdariya faşîst ya AKP-MHP'ê li dijî têkoşîna mafdar a gelê Kurd ji bo astengkirina çareseriyê serî li hemû rêbazên leşkerî û siyasî dide. Tevî van zext, gef û komkujiyan jî têkoşîna bi dehan salan a gelê Kurd ya li dijî asîmîlasyon û qirkirinê bi biryardarî didome.

Ji bo gelê Kurd qir bike butçeya şer ku xitimandinê mezin dike, li seranserê welêt dide ser pişta gelê xizan û krîza aborî hîn kûrtir dike.

Ji bo derketina ji nav van hemû nakokiyan, Birêz Abdullah Ocalan bi projeya konfederalîzma demokratîk pêşniyara çareseriya gelparêz ku wê ji bo jiyana wekhev û hevpar a gelan tevkariyeke mezin bike pêş xist.

Mîmarê Şoreşa Rojava Abdullah Ocalan ku bi modêla demokratîk, ekolojîk û azadiya jinê ku li dijî hêzên tarî û hovîtiya ku dixwestin li ser xaka Rojhilata Navîn serwer bibin, şeklekî nû yê civakî pêşxist. Bi têkoşîna bi biryar ya li ser vê modelê çeteyên hov ên DAIŞ'ê paşve xistin.

Fikrên Abdullah Ocalan li dijî şer aştiyê pêk yîne

Em di wê baweriyê de ne ku li dijî kaos û şerê ku ji aliyê hêzên emperyalîst û hevkarên wan ên herêmî ve li ser erdnîgariya Rojhilata Navîn, Tirkiye û Kurdistanê tê ferzkirin, ji bo jiyaneke hevpar a aştiyane ya civakî, fikrên Abdullah Ocalan xwedî girîngiyeke mezinin. Em wisa difikirin ku di van demên dawî de ji Qerebaxê heta Rojava, ji Rojhilat heta Filistînê gel li dijî êrîşên qirkirinê û emperyalîst jiyana hevpar a wekhev û azad diparêzin. Ji ber vê sedemê Birêz Abdullah Ocalan zêdeyî 25 salin li Girtîgeha Îmraliyê tê girtin, di bin tecrîdê de tê ragirtin. Ji Abdullah Ocalan 3 salin ku mafê wî yê hevdîtina bi parêzer û malbata wî re hatiye desteserkirin, tu agahiyek nayê girtin. Derbarê jiyan û tenduristiya wî de tu agahiyek me nîne. Em ku li erdnîgariya Tirkiye û Kurdistanê jiyana hevpar diparêzin, tavilê rakirina tecrîdê û azadiya fîzîkî ya Abdullah Ocalan ku di şert û mercên azad de bijî, diparêzin.

Em weke Yekîtiya Hêzê ya Demokratîk a Ewropayê radigihînin ku em beşdarî Pêngava 'Ji Abdullah Ocalan re Azadî û Ji Pirsgirêka Kurd re Çareserî' dibin û banga mezinkirina pêngavê dikin."

# Bîlancoya şerê Hemas û Îsraîlê

**Wezareta Tenduristiyê ya Filistînê ragihand ku ji 7'ê Cotmehê ve herî kêm 4 hezar û 137 filistînî ji ber bombebaranên Îsraîlê jiyana xwe ji dest dane.**



Li gorî daxuyaniya Wezareta Tenduristiyê ya Filistînê, ji 7'ê Cotmehê ve herî kêm 4 hezar û 137 filistînî ji ber bombebaranên Îsraîlê jiyana xwe ji dest dane.

Di daxuyaniyê de hat diyarkirin ku 13 hezar û 162 kes birîndar bûne. Herwiha hate gotin ku di nav miriyan de 16 kesên ku li bajarê Xezayê li dêra Ortodoks a Yewnan ya Azîz Porfiriyê hatibûn kuştin hene.

Li gorî şahidan, di êrişa hewayî de nuqteyeke li nêzî dêra ku gelek şêniyên Xezayê lê stirîne, bûye hedef. Di encama bombebaranê de dêra dîrokî zerer dît.

Li gorî daxuyaniya Wezareta Tenduristiyê di nava 14 rojan de li Xezayê 46 xebatkarên tenduristiyê mirin û 85 jî birîndar bûn.

Li aliyê din Filistîniyên li Xezayê hê jî li benda alîkariyên mirovî ne ku ji Misirê ji deriyê sînorî yê Refehê derbasî Xezayê bibin.

Li eniya Îsraîlê jî zêdetirî hezar û 400 kes mirin ku piraniya wan sivîl bûn. Îsraîl ragihandibû ku wan cenazeyên hezar û 500 çekdarên Hamasê dîtine ku di 7'ê Cotmehê de derbasî nav axa wan bûne.

# Çalakiya konvedanê di roja 5'an de dewam dike

**Çalakiya konvedanê ya li bajarê Qamişlo di roja 5'yan de bi beşdariya Meclisa Bajarê Tilhemîs, Desteya Perwerdeyê, Rêveberiya Sotemeniyê, sazî û meclisên sivîl ên bajarê Qmaişlo dewam dike.**

Bi daxwaza azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û çareseriya pirsgirêka Kurd di 10'ê Cotmehê de Pêngava 'Azadî ji Abdullah Ocalan re, Çareserî ji Pirsgirêka Kurd re' destpê kir. Ji çar aliyên cîhanê, akademîsyen, rojnamevan, rêxistinên civakî yên sivîl, partiyên siyasî, parlamenter, aktîvîstên têkoşerên maf, fîlozof, kesên hêjayî xelata aştiyê ya nobelê hatine dîtin, nûnerên rêxistinên jinan û gelên xwecihî pêngava 'Azadî ji Abdullah Ocalan re, Çareseriya Siyasî ji Pirsgirêka Kurd re' dan destpêkirin.

Ji bo piştgirya bi pêngavê re, di 17`ê Cotmehê de, bi pêşengiya Meclisa Malbatê Şehîdan, Partiya Yekîtiya Demokaratîk (PYD) û Kongra Star, çalakiya konvedanê li pêş avahiya NY[illegible]yê ya bajarê Qamişlo hat li darxistin û heta 23`ê Cotmehê wê dewam bike.




Di roja 5'an ya çalakiya konvedanê ya bajarê Qamişlo de, bi sedan xelkê bajarê Tilhemîs, Rêveberên Sotemeniyê, Desteya Perwerdê, Mamoste, nûnerên ji saziyên Rêveberiyê yên Qamişlo beşdarî çalakiyê bûn.

Di destpêka roja 5'an ya çalakiyê de, kesên beşdar deqeyeke rêzgirtinê li ser giyanê Şehîdan rawestiyan, piştre li ser navê başdaran wî axaftin werin kirin.

Derbarê çalakiyên Konvedanê de endama Komîta amedkar Mîdiya Mihemed El Heyawî diyar kir ku çalakiya kovedanê ya li bajarê Qamişlo di roja xwe ya 5`emîn de, bi coşeke mezin dewam dike û wiha got: "Ji bo piştgiriya pêngava 'Azadî ji Abdullah Ocalan re, Çareserî ji Pirsgirêka Kurd re' tevahî pêkhateyên kantona Qamişlo beşadrî konê çalakiyê dibin, herwiha nameya ji çalakiya kovedanê li pêşiya Netewên Yekbûyî, ew e ku em dengê xwe bighînin tevahiya cîhanê da ku cîhan bi erkê xwe yê exlaqî rabe û azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan misoger bibe. Di roja 5'an ya çalakiyê de wê daxuyanî û sînevisyon derbarê kompiloya li ser Rêber Apo bê nîşandan. Piştî ku çalakiya kovedanê li bajarê Qamişlo di 23'ê mehê de bi dawî bibe, wê daxuyaniyek li pêşiya navenda Neteweyên Yekbûyî ya bajarê Qamişlo bê dayîn."

# Hevpeymana Edena

Hevpeymana Edenayê di 20'ê çotmeha 1998'an li bajarê Edenayê yê Tirkiyê ji aliyê Sûriyê û Tirkiyê ve hatiya îmzekirin.

**Navenda nûçeyan**




Encamên ku ji Şerê Cîhanê yê Yekem derketin, pêwîstî bi xêzkirina sînorê Tirkiye-Sûriyê bi peymaneke Tirkî-Fransî hebû. Ji ber ku Fransa wê demê hukmê xwe li ser Sûriyê hebû. Di encama vê peymanê de, ji wê demê heta sala 1939'an, erdên ku kembera bakurê Sûriyê dihewand, hêdî hêdî desteser kirin.
Piştî wê, têkiliyên Tirkiye-Sûriyê heta dawiya salên 1990'î ket qonaxeke alozî û nakokiyan, ku xalên wê li ser mijarên sînor, av, kurd, paşeroja Iraqê, peywendiyên bi Amerîkayê re, Îsraîl û polîtîkayên herêmê.
Di salên 1980'î de, faktora sereke ya aloziya di têkiliyên navbera Tirkiyê û Sûriyê de, ew bû ku tirkiyê Sûriyê bi piştgiriya PKK'ê ya ku ji sala 1984'an de li dijî dewleta tirk a faşîst şerê çekdarî daye destpêkirin tewambar dike.
Di destpêka sala 1996'an de di serdema serokê tirk Suleyman Demirel û serokwezîr Mesut Yilmaz de, Tirkiyê hişyarî da rêjîma Sûriyê di bin serokatiya Hafiz el-Esed de, ku divê rasterast piştgiriya Partiya Karkerên Kurdistanê rawestîne. Ji bo parastina ewlekariya xwe ya netewî çi tedbîrên pêwîst hene, neçar mane ku bigrin.
Di Cotmeha 1998'an de, krîza siyasî di navbera Tirkiye û Sûriyê de gurtir bû, ji ber ku Enqerê hêzên xwe li ser sînorê Sûriyê kom kir, û gefa dagirkirina sînorên axa sûriyê dida û digot: Eger rejîma Sûriyê piştgiriya Partiya Karkerên Kurdistanê û dabînkirina cihên ewle ji bo wan nerawestîne wê axa sûriyê dagirbikin.
Komkara welatên Ereb, Misir û Îranê ji bo rawestandina aloziya berdewam û gihîştina çareseriyeke siyasî ku pêwîstiya wê bi çareserkirina kirîza di navbera her du welatan de heye, destwerdan kirin û di encama destwerdana navbeynkariyên navçeyî de pêk hat. Navê "Peymana Edeneyê" peymana ewlehiyê lê kirin, ku di 20'ê Cotmeha 1998'an de li bajarê Edeneyê yê Tirkiyê di navbera her du welatan de hatibû îmzekirin.

### Şertên peymanê

Xalên peymana ku di navbera Tirkiye û Sûriyê de hatiye îmzekirin:
-Ku Ji niha û pê ve Rêber Abdullah Ocalan ne li Sûriyê be û bê guman destûr nayê dayîn ku derbasî Sûriyê bibe.
-Destûr nayê dayîn ku endamên PKK'ê derbasî Sûriyê bibin.
-Ji niha ve kampên PKK'ê li ser xaka Sûriyê naxebitin û bêguman destûr nayê dayîn ku çalak bibin.
Gelek endamên PKK'ê hatin girtin û sewqî dadgehê hatin kirin. Têkildarî navên wan rêzikname hatin amadekirin. Sûriyê ev rêzikname pêşkêşî aliyê Tirkiyê kir û aliyê Sûriyê jî ew xalên ku li jor hatine gotin piştrast kirin.
Herwih di pêveka jimare 3 de hat destnîşankirin ku her du alî di dema îmzekirina peymanê de dihesibînin ku nakokiyên sînorî di navbera wan de bi dawî bûne û ti daxwaz û mafên wan li ser erdên aliyên din tune ne, ku tê wateya ku Sûriyê dev ji doza navçeya Îskenderûnê berda.
Di pêveka jimare 4 di rêkeftinê de hatiye diyarkirin ku aliyê Sûriyê têdigihe ku negirtina tedbîr û erkên ewlehiyê yên ku di vê rêkeftinê de hatine destnîşan kirin, mafê Tirkiyê dide ku hemû tedbîrên ewlehiyê yên pêwîst li hundirê axa Sûriyê heta kûrahiya 5 km bigire.

### Peymana Edeneyê ne tenê li dijî Abdulah Ocelan û tevgera PKK'ê bû

Weke ku tê zanîn beriya peymanê bi taybetî di 9'ê Cotmeha 1998'an de di encama zextên dewleta Tirk a faşîst û NATO'yê de Rêber Abdullah Ocalan neçar ma ji Sûriyeyê derkeve. Abdullah Ocelan ev qonax weke "komployeke navneteweyî" bi nav kir. Bi vê nirxandinê derdikeve holê ku hêza ku mudaxeleyî operasyonê kiriye ne tenê dewleta Tirk bû. Bi gotineke din, ji komploya 9'ê Cotmehê, qonaxa dagirkirina NATO'yê ya li Sûriyeyê bi rêya dewleta Tirk, rastî dest pê kir. Bi peymana 20'ê Cotmeha 1998'an a bi navê Peymana Edeneyê, dewleta Tirk a faşîst mafê fermî yê dagirkirina Sûriyeyê bi dest xist.
Lewma bi komploya 9'ê Cotmehê û Peymana Edeneyê û di şexsê Abdulah Ocelan de destwerdana NATO û Îsraîl a bi pêşengiya DYA'yê li dijî hemû herêmê bi taybet Sûriyeyê dest pê kir. Ji ber vê yekê, mirov bêje ku Peymana Edeneyê tenê li dijî Abdullah Ocelan û Kurdan hatiye kirin, şaş e. Ji ber ku Peymana Edeneyê di cîbicîkirina "Projeya Rojhilata Navîn a mezin" xaleke girîng nîşan da. Rêze pêşketinên ku dagirkirina Afganîstan, Iraq û Lîbyayê, êrîşên DAIŞ'ê, tevgerên Îsraîl ên li herêmê û hwd nîşan didin, rasterast bi komplo û gavên piştî Peymana Edeneyê ve girêdayî ne. Ji bona ku rastiya kompoyê ji raya giştî re hîn baştir were ronîkirin û negihêje encamê ku dixwaze, Abdullah Ocelan di rewşa girtîgehê ya giran de bi riya 5 berge ji parêznameyên xwe bi rengekî berfireh projeya konfederalîzma demokratîk amedekir û gihande gelê Kurd û tevahî cîhanê û ew bû mîna vejîna sêyemîn ya Rêber Apo û gelê Kurd.

### Bi nûkirina peymanê re qonaxa dagirkeriyê dest pê kir


Peymana Edeneyê di sala 2010'an de weke "Peymana Hevkariya li dijî Teror û Rêxistinên Terorê" di navbera dewleta Tirk a faşîst û hikûmeta Şamê de hat nûkirin. Li gorî wê, ev peymana ku ji 23 bendan pêk tê, dê sê salan derbasdar be. Di wê navberê de hat gotin ku her du welat li dijî rêxistinên ku gefê li wan dixwin tedbîran werbigirin û rê li ber hemû çalakiyên wan bi taybetî li dijî Partiya Karkerên Kurdistanê bigirin û her du welat li hev kirin ku rê nedin ti hebûn, piştevaniya lojîstîk, perwerdekirin, veguhestina çekan, di operasyonên hevpar de hevkariyê bikin, girtiyan radest bikin, agahî, belge û îstîxbaratê bi hev re biguherînin.
Piştî vê nûbûnê di sala 2012'an de qonaxa dagirkeriya dewleta Tirk a faşîst li Sûriyeyê dest pê kir. Hêzên bi navê opozîsyona Sûriyê di çarçoveya projeyên "perwerdekirin û çekdarkirinê" yên ku bi destê tirkiyê dihate kirin û armanca wan li gorî berjewendiyên xwe destwerdana Sûriyê hedefgirtina gelê Kurd e. Bi serhildana Birayên Misilman a di Sibata 1982'an de ku ji aliyê dewleta Tirk a faşîst ve hat destekkirin, Tirkiyeyê encamên ku ji Peymana Edeneyê dihat xwestin ji ber ku bi dest nexist, di sala 2010'an de xwest ku li gorî berjewendiyên xwe peymanê nû bike. Ji ber wê û di şexsê Abdullah Ocelan û Partîya Karkerên Kurdistanê, xwest ku li ser gelê Kurd û li pey hev komkujî û qirkirinan pêkbîne. Herweha dewleta faşîzma Tirk xwest ku xeyalên xwe yên Osmaniya nû û projeya peymana neo-osmanî pêk bîne. Ji ber vê yekê, ev rêkeftin dihat wateya ku hikûmeta Şamê li şûna hevkariya dualî û şerê hevbeş li dijî terorê, ji bo dawiya xwe amade dike. Tişta balkêş ew e ku her çend li aliyê Tirkiyê bi dehan kampên çeteyan hene jî, hikûmeta Şamê nikare yek gav jî li dijî wan bike. Kesên ku di van kampên kirêt de hatine perwerdekirin û çekdar li dijî hikûmeta niha ya Şamê şer dikin. Lê belê hikûmeta Şamê li hemberî van çeteyên ku dewleta Tirk a faşîst destek dane wan û li ser xaka Sûriyeyê di destê dewleta Tirk a faşîst de amûrê mêtingeriyê ne, nikare gavekê jî bavêje. Ji ber "pêdiviyên Peymana Edeneyê" yek gav nemaye ku nekare daxwaz jî bike û nekare di çarçoveya plana hevpar a li dijî van hêzên dijberê Sûriyê yên di nav sînorên Tirkiyê de, yek gav bavêje.

### Peymana xiyanetê li dijî hemû gelê Sûriyê

Di çarçoveya van pilanan de Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî hatin dagirkirin. Dewleta Tirk a faşîst a dagirker êrîşên xwe yên dagirkeriyê zêde kirin, bi îdiaya ku li gorî Peymana Edeneyê tevdigerin, dewleta Şamê ya ku xwe serwer e, li hemberî êrîşên dewleta Tirk a faşîst bêdeng ma, an jî bû hevparê van êrîşan. Ji daxuyaniyên dîktatorê dawî yê faşîst Erdogan û şagirtên wî tê dîtin ku rêveberiya Şamê jî hevkarê sereke yê van êrîşan e. Di berdêla dijberiya hêzên demokratîk a di vê qonaxa tifaqê de, osmaniya faşîst di her pêngavê de beşek ji xaka Sûriyê dagir kir. Rêveberiya Şamê ku berê digot "Navçeya Îskenderûn xaka Sûriyê ye" dikare xaka xwe ya serwer careke din vegerîne. Lewma ev peyman ne tenê li dijî Kurdan e, lê li dijî tevahiya gelê Sûriyeyê ye. Dagirkeriya Tirkiyê êdî ne li gor hevpemana hatî destnîşankirin ku tenê kare 5 km derbasî xaka Sûriyê bibe, lê li gor xwe zêde kir û êdî sînor ji destwerdana wê re nîne û kes jî dengê xwe jêre nake.

### Ev mijar li Soçî û Tehranê jî hat rojevê

Piştî hevdîtina 19'ê Pûşbera 2022'an a li Tehranê, serokomar û serokê faşîst Erdogan û Pûtîn hevdîtin pêk anîn, herwiha piştî civîna Tehranê ya di 5'ê Tîrmeha 2022'an de di navbera Pûtîn û Erdogan de li Soçiyê, mijara nûkirina Peymana Edeneyê û pêşxistina têkiliyan bi hikûmeta Şamê re hat bilindkirin. Di vê çarçoveyê de îro em dibin şahidê geşedanên girîng. Piştî hevdîtinên Soçî û zêdebûna êrişan li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê. Bersiva pirsa, lihevkirinên Soçî û Tehranê çi bûn, bi êrîşên ku roj bi roj zêde dibin eşkere bû. Berdevkên hikûmeta faşîst a Partiya Dad û Geşepêdanê û Partiya Tevgera Netewî qebûl dikin ku têkiliyên bi hikûmet û îstixbarata Şamê re girêdayî têgihîştina berê ye. Di vê qonaxê de tê ragihandin ku hikûmeta Şamê bi Hêzên Sûriyeya Demokratîk re li dijî êrîşeke terorî ya gengaz a dewleta Tirk a faşîst ketiye nava tifaqeke leşkerî. Lê li dijî Rêveberiya Xweser agahiyên îstixbaratî bi Tirkiyeya faşîst re parve dike. Rûsya ji aliyekê ve hikûmeta Şamê û Rêveberiya Xweser neçarî danûstandinan dike, li aliyê din jî bi Tirkiyeya faşîst re lihevkirinekê didomînin. Ji milekî din ve dagirkeriya tirk ya qirker û faşîst û bi taybet piştî dagirkirina Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî û bi hevkariya Rûsiya, hikumeta Sûriyê û çavgirtinên hêzên navnetewî serweriya xwe li ser tevahî xaka sûriyê daye avakirin.
Li ser erdê û hem li ezmanê Sûriyê ji derveyî QSD'ê û gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê tu hêzên ku li hemberî êrişên dagirkeriyê bisekinin li ser erdê tuneye. Di navbera hemû hêzan de û li gorî berjewendiyên wan planên xeternak û veşartî di serî de li ser gelê Kurd û rêveberiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê têne meşandin û êrişên ku têne meşandin rasterast destkeftiyên rêveberiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê hedefdigre û dixwaze qirkirina gelan pêkbîne.



## Çarenivîsa Filistîn û Kurdistanê

**Ahmet Aktaş**

Du welatên bindest in û bi piralî dişibin hevdû. Herwiha çarenûsa wan jî, bi giranî weke hev in. Bêgûman hinek aliyên wan ên cûda jî hene. Ka em hinekî di ber çavan re derbas bikin rewşa herdû welatên bindest; Kurdistan û Filistîn!
Ji aliyê dewletên serdest ve mirov bala xwe bidê, stratejî û tektîkên wan ên li ser gelê Filistînê û Kurdîstanê didin birêvebirin, kêmzêde weke hev in.
Polîtîka û kiryarên dewleta Israîl ku li ser gelê Filistîn dide maşandin, heman polîtîka û kiryarên dewleta tirk jî li ser gelê Kurdistanê dide meşandin. Armanca hemû dewletên dagirker/mêtinger(Îran, Iraq û Sûriye jî), gelên bindestê xwe asimile bike, di nava gelê xwe yê serdest de bihelîne, bike tirk û bike ereb û hwd.
Îca vê dema dawî, bi taybetî dewletên Israîl û Tirk, bi asimîlê, kuştinê, girtinê, sirgûnê û hwd. jî ranawestin, dixwazin navê gel û welatên wan jî nehêlin, şûna van gelên xwecih, malbatên gelên biyanî bi cîh bikin û wan welatan bixin nava sînorên welatên xwe.
Kurt kurmancî, Israîl hewldide Filistînê bixe nava sînorê xwe û wê xeyala "Israila Mezin" cîbicî bike. Dewleta tirk jî, bi heman armancê êrîşî Başûr, Rojava û Rojhilat dike, da ku wan jî bixe nava sînorê Tirkiyeyê!
Van êrîşên nuha yên faşist R.Erdogan ên li ser Başûr û Rojava, yên Netanyaho yên li ser Xezayê û hwd.bi van armancan pêktên.
Ka em bala xwe bidin tevgerên dijî armancên van mêtingeran. Heke Tevgera Azadiya Gelê Kurdistan a bi felsefeya Rêber APO tê birêvebirin cuda were danîn, rewşa opozisyon/dijberên van dewletan jî dişibin hev.
Mijara herî giring û bingehîn ev e: Him dewletên mêtinger him tevgerên dijberî wan(opozisyon), pişta xwe sipartine dewletên biyanî. Yek ji wan jî, pişta xwe naspêrin hêza gelê xwe. Di destpêka herdû şoreşan de, van tevgeran, hîn bi tevayî xwe nespartibûn dewletên biyanî, gel li dora wan kom dibûn. Weke mînak li Filistînê Tevgera Elfetihê, Eniya Gel, Eniya Demokrat û bi tevayî bi serokatiya Yaser Arafat û bi navê Tevgera Rizgariya Filistîn, dikaribûn gel li dora xwe komkiribane. Lê piştî ku dewletên hegemon, van tevgeran kedî kirin û xistin xizmeta xwe, êdî baweriya gel şikest û nuha bi giranî ji wan dûr ketiye.
Li Kurdistanê ji bo Tevgera Berzaniyan jî heman şîrove dikare were kirin. Lê belê nuha, rewşa HEMASÊ û BERZANIYAN hema bûne weke hev. Herdû jî, ne bi doza azadiya gelên xwe re ne, bi dewletên mêtinger re ne.
Çare; divê dawî li baweriya bi dewletên biyanî were anîn. Li ser baweriya bi hêza gelên xwe Tevger werin perwerde kirin. Herwiha divê, ne li gel dewletan, belê li gel hêzên sivîl ên navneteweyî têkilî werin xurt kirin û xebatên hevpar werin meşandin.
Nuha hêza pêşengiyê ji vê zihniyetê û xebatê re dike, Tevgera Azadiya Gelê Kurdistanê ye, ya li ser şopa heqîqetê ya felsefeya Rêber APO dimeş e.
Heke di vê çarçovê de, tevgêr têbikoşin, ew çarenûsa zulumkar a li ser gelê Kurdistanê û Filistînê dê karibe were guhertin.



# Ji tariyê ber bi ronahiyê ve

Şeş sal di ser rizgarkirina Reqayê re derbas dibin. Piştî berxwedaneke mezin a 134 rojan di 20'ê Cotmeha 2017'an de bajarê Reqayê ku bûbû sembola zilm û tarîtiyê, ji aliyê QSD'ê ve ji destên çeteyên hov yên DAIŞ'ê hat rizgarkirin. Bajarê ku sembola tarîtiyê bû, niha bûye sembola demokratîk-kirina Sûriyê û xwişk û biratiya gelan.

**Deriya Çiya/Qamişlo**



Bajarê Reqayê li peravên rojhilatê Firatê ye. Di derbarê nav û dîroka wê ya kevnar de gelek nêrînên cuda hene. Hinekan piştrast kirin ku di sala 244 berî zayînê de hatiye damezrandin û navê wî (Callinicos) li ser navê Seleucus (damezrînerê bajêr) lê hatiye kirin. Di xwendinên din de, Reqa di serdema sêyem de vedigere Padîşahiya Tutul û Hezarsala duyem a berî zayînê, dîroka wê ya rast jî digihêje hezarsaliya 9'an a berî zayînê, Reqa ango 'kevirê rût' ji aliyê Aramiyan ve hat bi cih kirin û li wir çend mîrektiyan ava kirin û piştre Asûrî jî li pey wan hatin.
Di warê cih de; di tevahiya Geliyê Firatê de cihekî stratejîk e, ji ber ku ji hemû aliyan ve xaçerêyekê nîşan dide, li bakur Tirkiye, li başûr Şam, li rojhilat Iraq û li rojava jî Heleb e. Rûbera wê 19,600 km2 û bi qasî milyonek kes lê dijîn. Ji bilî vê yekê jî, avhewaya wê ya nîvziwa ya Behra Spî ya bi havînan ve tê diyar kirin û bi xweşbûna xwe tê naskirin. Reqa bi bermay û bermahiyên xwe yên dîrokî ji bajarên din ên Nîvgirava Sûriyê ne kêmtir e, ji ber ku Keleha Cebar a navdar, Qesra Hergla heye.

### Giringiya Reqa yê

Weke bajarên din ên Sûriyê, Reqa jî di deriyê xwe yê sereke re derbasî krîzê bû. Piştî destpêkirina kirîza Sûriyê, di sala 2011'an de, hejmareke zêde ji xelkên Sûriyê ji bo xwe ji agirê şer rizgar bikin, koçberî Reqayê bûn, û piştre bû keleha sereke ya çeteyên ku navê opozisyênê li xwe dikirin û bi rêya wan çeteyên DAIŞ'ê derbasî nav bajarê Reqayê bûn. Di sala 2014'an de çeteyên DAIŞ'ê bajar bi tevahî kontrol kir û ji ber ku nêzîkî sînorên Iraq û Tirkiyê ye wek paytexta xwe hilbijartin.
Di wan 4 salên ku wan Reqa bi temamî kontrol kirin, çeteyên tundrew ji piraniya welatên cîhanê li wir kom bûn. Di vê demê de, Reqa veguherî navendeke binçavkirinê ji bo gel û ji bo têkbirina çeteyên rizgarkirina bajar pir girîng bû. Çeteyên DAIŞ di dema kontrolkirina bajêr de, hewl da ku bandorê li ser hişmendiya xelkê bike û kîn di navbera pêkhate û eşîran de belav bike. Û heta di nav endamên heman malbatê de, çanda kuştin û tolhildanê teşwîq kir, ne pêkane ku em hin kesan bibînin ku kêmasî di bin bandora çanda DAIŞ'ê de mane û ne dûr e ku ev bajar di encamê de çareserî û aramiyeke herî baş çênebe, cudahiyên diqewimin, serhildanên fikrî, bîrdozî û cudahiyên di navbera pêkhateyan de, çareseriya herî baş ji bo Reqa vegere rewşa xwe ya xwezayî ew e ku şêniyên wê bi rêya komîteyan rêveberiya xwe bikin saziyên sivîl ên ku bi çanda cihêreng a Reqayê re hevkariyê bikin.

### QSD`ê baweriya gel qezenc kir

Dema ku Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD'ê) bi hemahengiya li gel Hevpeymaniya Navdewletî amedekariya destpêkirina hemleya rizgarkirina Reqayê kirin; Tirkiye ji bo ku beşdarî hemleya Xezeba Firatê bibe bi lez xwe nêzî Waşintonê kir û dadbar kir, dema Erdogan teqez kir: "Ji bo rizgarkirina Reqayê em amade ne ku bi Amerîkayê re hevkariyê bikin. "Amerîka bi tevahî fêm kir ku Tirkiye li dijî formula hevpeymaniya bi QSD'ê re ye. Ji bo vê; Ew ji beşdariyê hat dûrxistin û di daxuyaniyekê de ji aliyê Esed ve, wî got: "Şam amade ye ku bi Rojava re hevkariyê bike ji bo rizgarkirina Reqa yê." Şam tu carî bi Washington re ne lihevhatî bû, ji ber vê yekê çawa li ser hevkariya leşkerî ya ku wan digihîne hev dema ku Amerîka Li rojhilatê Firatê herêmek bi bandor ava kir û baregehên leşkerî, hêzên şer û şêwirmendan ava kirin. Lê çima Amerîka di rizgarkirina Reqayê de bi Kurdan re hevalbendî kir?
Pêşî Fermandarê Biryargeha Navendî General Joseph Votel tekez kir ku giringe piştgiriya Hêzên Sûriya Demokratîk bikin. Ji ber ku gelên Bakur û Rojhilatê sûriyê bi pêşengtiya gelê Kurd, ji bo têkbirina DAIŞ'ê girîngtir in. Ji aliyê xwe ve jî rêxistinbûn û perwerdekirina hêzên xwe ji bo parastina herêmên xwe û rizgarkirina Bakurê Sûriyê ji çeteyên kirin û li Reqayê (Meclisa Leşkerî ya Reqayê) û meclîsa sivîl ku ji 140 endaman pêk tê hate ava kirin.
Ji ber ku QSD'ê di şerê li hemberî çeteyên DAIŞ'ê de xwe isbatkir hêzên hevpeymanî yekser bi Hêzên Sûriyeya Demokratîk re hevalbendî avakir. Yekane hêzên ku li hemberî çeteyên DAIŞ'ê derketin û gelek herêm ji destê wan derxistin û rizgar kirin. Ji ber ku QSD'ê ji şervanên Yekîneyên Parastina Gel YPG'ê û Yekîneyên Parastina Jin YPJ'ê pêk tê û tev jî di şer de xwedî ezmûnên bi salan e. Herwiha ji bona pêşeroja Sûriyeke demokratîk û azad Felsefeya neteweya demokratîk ji xwe re esas digrin. Ji ber van sedeman hêzên hevpeymanî bi wan re hevalbendî danî û nekarî bi Iraq û Tirkiyê re hevkariyê bike. Ji milekî din ve jî hêzên hevpeymanî gihiştibûn wê baweriyê ku bi tena serê xwe û bê desteka QSD'ê wê nikaribin di şerê li hemberî DAIŞ'ê de serkeftinê bi destê xwe ve bînin. Ji ber ku di şerê li hemberî hemû hêzên çete yên ku êrişî Bakur û Rojhilatê Sûriyê kirin û di serî de Cebhet Alnusra û herî dawî jî DAIŞ'ê QSD'ê xwe isbat kir û karî baweriya gel û ya heremê û cîhanê jî qezenc bike.
Lehengiya şervanên jin ên Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) ji hemû cîhanê xuya bû û xwedî bandoreke mezin bû. Ji ber ku wan bi pisporî û lehengî cihê xwe di şer de girtin û ji bon hemû jinên cîhanê bûne pêşeng.

### Siyaseta ku DAIŞ'ê bi taybet li ser jinan li Reqayê dida meşandin

Ji dema kontrolkirina DAIŞ'ê ji Reqayê re, çeteyên DAIŞ'ê bajar û hemû herêmên ku dagirkiribûn, ji tevahî gel re û bi taybet ji jinan re veguherandibûn girtîgeh û goristan. Hemû aliyên jiyanê ji Reqayê winda bûn piştî ku DAIŞ'ê bajar kontrol kir, hemû taybetmendiyên şahî û bedewiyê ji dest da û reş lê hate kirin. Ew a ku çeteyan ji xwe re kiribûn paytext ji rengên wê tenê reş mabû, al reş bûn, cil û bergên mêran reş bûn, dîwarên bajêr reş in, avahî reş in, cil û bergên jinan jî reş in. Piştî ferzkirina qanûnên DAIŞê, rengên geş ên cil û bergên jinan li sûk û taxan winda bûn. Hemû jin wek hev in, ferq û cûdahiya yekê ji ya din tune ye. Çeteyan derfetên jiyanê ji jinan re nehiştibûn û tenê wekî kole bi kar tanîn. Bazarên ji bona firotina jinan avakirin û di serî de jinên Ezidî û gelek jinên din jî li van bazaran dihatin firotin. Herweha çeteyên DAIŞ'ê gelek jin revandin û tecawizkrin. Çeteyan girûpa Lîwaya El-Xensa ava kirin û rola wê lêgerîna jinên ku qanûnên wan binpê dikin û li kolan, bazar û heta li malan jî ew dihatin girtin û dîlgirtin. Jinên ku ev zagonên wan pêknedianîn bi lêdanê û cezayên pereyan li xizmên wan yê mêr dihatin sepandin. Ev jî bû sedema rakirina jinan ji jiyana malbatî, hevaltî û jiyana giştî re.
Lê bi rizgarkirina bajarê Reqayê re û bi saya Hêzên Sûriya Demokratîk QSD'ê piştî şerê 134 rojan û di 20'ê Cotmeha 2017'an de. Ew roj bû roja ronahiyê ji gelê herêmê re bi taybet ji jinan re. Jinan bi saya projeya neteweya demokratîk çarçefa reş qetandin û di refên pêşîn ên rêxistinkirina civakê û parastina wê de cih girtin.

### Gelê Reqayê pştî rizgarkirina bajêr rêveberiya xwe avakir

Piştî rizgarkirina Reqaê ji destê çeteyên DAIŞê, Hêzên Sûriya Demokratîk got: "Bajarê Reqa beşek ji Sûriyeyeke federal û ne navendî ye" û amadebûna xwe weke hêzeke niştimanî ji bo parastina herêmê ji hemû gefên derve nîşan da; tekez kir ku wê siberoja bajêr di çarçoveya Sûriyeya Federaliya Demokratîk de ji aliyê gelê wê ve diyar bibe.
Gelê Reqayê ku piraniya şêniyên wê Ereb in, niha herêmên xwe bi avakirina saziyên xwe yên sivîl û leşkerî, ji nû ve avakirina bajar û parastina bajêr bi rêya hêzên ewlekariya hundirîn birêve dibin. Meclisa Sivîl a Reqayê ji navdarên êlan, kesayetên siyasî, çandî û pîşeyî pêk tê. Ev meclis li gorî hemû pîvanan rêveberiya bajêr dike, û meclîsên din li pey wê ne, wek Meclîsa Tebqayê, û komîteyên nû hatine avakirin, şaredarî û ciwanan pêk tê.
Ji destpêka kirîza Sûriyê ve, kurd ne alîgirê cudakirin û perçekirina laşê Sûriyê û gelê wê ne, ew alîgirê yekîtî, yekîtiya ax û gelên Sûriyê ne. Li gorî diruşma biratiya gelan û avakirina Sûriyeya demokratîk bi makezagoneke ku her kes ava dike û pêk tîne, kar kiriye û wê ji neha û pêve jî vî karî berdewambike.



## FENER

## Ancax şoreşgeriya Netewa Demokratîk Be..

**Idrîs Henan**

Mirov di aliyê xwe yê manewî de zêde dijî û bi rewşa tekaneya hebûnê re bûye yek zindî. Her tiştî jî li gorî mutleqbûna ruhî teşe lê bar dike. Lew re; diyardeyên cuda yên vê hebûnê jî, dunyaya heyî diteyisîne. Taybet insanên li Rojhilata Navîn di hundirê xwe de cewherê ruhî dihewînin û bi rêya lêgerînên ruhî û ayîndariyê têkilî û jiyana xwe ava dikin. Ji ber vê jî mirov têdigihêje ka çima netew dewlet û sosyalîzm li vê herêmê bi ser neketin. Di heman demê de mirov fêm dike çawa tevgerên olî weke altirnatîf derketine dika siyaseta li herêmê. Mirovan li Rojhilata Navîn nikarîn bê ol jiyan bikin. Ji xwe Rêber Apo vê yekê di parêznameyên xwe de isbat dike ku mirov nikare li Rohilata Navîn bê aliyê ruhî jiyan bike. Ev jî taybetmendiya miorv e. Ji ber vê jî çi tewriyên hewl dane li şûna olê dagirin, bi binketine. Ji xwe desthilatdariyên herêmî bi rêya nasnameya olî ideolojiya xwe ava dikin û di bin alayên xweda û pêxemberan, şerê li dijî olên dîtir de, sempatiya gel qezenc dikin û desthilatdariya xwe mayînde dikin. Yanê hinek nirxan li olê bar dikin û dibin desthilatdar. Angor olê diçewisînin û weke navgîneke ji bo bigihêjin desthilatdariyê bikar tînin.
Navenda hegemon dualîteya ol – desthilatdarî baş xwend û di oxira serweriya xwe de baş çewisand. Lewre jî me dît ji bona hevrikiya xwe ya navendîbûna hegemoniyê çawa ew tevgerên olî bi siyasetê re kirin yek û kirin desthilatdar. Ev tablo li tevayî herêma Rohilata Navîn derbasdar e. desthilatdariyên AKP û Netinyaho mînakên wê yên beloq in. Lewre ti cudahiya herdû sîsteman nîne.
Ji bona ku mirov naverok û cewherê van herdû sîstemên mînak ku qonaxa faşîzmê dijîn, nas bike, bila pir dûr neçe. Tenê nêrînek li dîroka nêzîk têrê dike ku mirov têbigihêje rastiya wan. Realîteya heyî, encamên li ser erdê û yekbûna siyaset û armancên herdû aliyan, bi şiklê hov ê êrîşên herdû aliyan re diyar dibin. Tirkiyê li Kurdistanê qir dike, dikuje, talan dike, koçber dike û komkujiyan pêk tîne. Dewleta Îsaraîl jî li Filistînê heman tiştî dike. Hewl didin gelên bindest ji dunayayê qut bikin û çi eserên wan hebin tune bikin. Ji xwe bê şerim in jî. Herdû jî; Erdogan û Netinyaho, dibêjin ku ew ê tune bikin. Ango, ew ê Kurdan tune bike û yê dîtir jî wê Filistîniyan tune bike. Wê yekê jî dikin. Komkujiyên li Filistînê û Rojava tên kirin wê yek bi zelalî rave dikin. Bêguman xwînmijên weke Erdogan û Netinyaho ti nûnertiya gelên Tirk û Cihû nakin.
Ya ji bo me girîng ew e ku em zanibin herdû jî derçûyê heman dibistana netewperest – olperest in. Çendîn li ser ekranan bibêjin "Ez bi Kurdan re me, Ez bi Filistîniyan re me" derewan dikin û tenê sloganên dîmagojîk in ku hewl didin desthilatdariya xwe biparêzin.
Çawa li jor jî me gotiye ku Rojhilata Navîn herêmeke wisa ye ku mirov nikar bê aliyê xwe yê manewî tê de jiyan bike, cografyaya wê jî landika qedîm a gelan û baweriyan e. Ti rêbazên biyanî yên jiyankirinê qebûl nake. Her tim gelên li wê herêm û baweriyên wan bi hev re, bi wekhevî, jiyan kirine. Lew re jî çarenûsa wan yek e. Ancax bi bilindkirina têkoşîna hevbeş a gelan, li ser bingehên azadî û demokrasiyê, geşkirina berxwedana hesabxwestinê, bi şoreşgeriya Netewa Demokratîk faşîzm, zilm û zordarî têk biçin.